Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 407 nameronahi@gmail.com 6 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# ZOZAN JÎ LI KURDAN HATIN QEDEXE KIRIN

Li Geverê piştî Zozanê gundê Serdeştê hat qedexekirin, buhayê kirêya zozanan 2 qat zêde bû. Koçerên ku zozanên wan hatin qedexekirin, neçar man ji bo 40 rojan bi 20 hezar lîreyên Tirk zozan kirê bikin. Welatiyên ku 3 salin heman rewşê dijîn xwestin qedexeyên zozanan bi dawî bibe.

Li Colemêrgê 7 meh borîn hêj qedexeyên zozanan bi dawî nebûne. Li şûna qedexe bi dawî bibin, qedexeyên din tên îlankirin. Welatiyên herêmê ku koçer in û debara xwe bi sewalkariyê dikin, li dijî qedexeyan bi îsyan û hawar in. Welatiyên gundên herêmê diyar kirin ku 3 salin di bin qedexeyan de dijîn û xwestin qedexeyên zozanan bi dawî bibin. Welatiyên gundê Serdeştê yên navçeya Geverê 3 salin di bin qedexeyan de dijîn.

**ÊDÎ BES E**


Welatiyên gundên Serdeştê yên ku 3 salin di bin qedexeyan de dijîn û nikarin biçin zozanên xwe bertek û nerazîbûn nişan dan û gotin êdî bes e. Welatiyê Gundê Serdeştê Musa Karaman li dijî qedexeyên zozanan bertekên xwe anî ziman û wiha got: "Piştî bahar hat û demsala zozanan dest pê kir, herêm hatin qedexekirin. Ji ber vê yekê em neçarin biçin zozanên derve. Em ji bo 40 rojan 20 hezar TL heqê mêrg û sozanê didin. Zivistan dijwar derbas bû û pêwiste em biçin zozanan. Lê zozanên me hatin qedexekirin. Em neçarin biçin zozanên derve. 3 salin em di bin qedexeyan de dijîn. Em nikarin biçin zozanên xwe. Êdî bes e bila ev qedexe bi dawî bibin. Em bi vî şiklî nikarin sewalkariyê bikin. Karaman, anî ziman ku li gundê wan welatî tenê debara xwe bi sewalkariyê dikin û wiha got: "Ji ber 3 salin zozan tê qedexekirin û sewalkarî zahmet e hêjmara sewalên gund ji 15 hezaran mihî (pez) daket 7 hezar mihî."

Welatî Suleyman Karaman jî anî ziman ku piştî zozan hatin qedexekirin lêçûna wan 4 qat zêde bûye û êdî nikarin sewalkariyê bikin û nikarin pez xwedî bikin. Karaman wiha got: "Ewlehiyê hincet nîşan didin.





Lê ez 70 salî me û heta niha her dem derketim zozanan. Heta niha tiştek li min nehat. Tiştek ne bi me û ne jî bi sewalên me hat. Di 3 salên dawî de ji ber polîtîkayên hikûmetê malê me





tune dibe. Niha zozanên Warê Marê û Kelûkê qedexe ne. Em nikarin biçin zozanên xwe

**7 MEH IN ZOZAN QEDEXE NE**

Karaman, destnîşan kir ku Erdogan 7 meh berê soza ku qedexeyên sozanan rake da û wiha got: "Buhayê kayê zêde bûye. Berî ku qedexe bê îlankirin me hemû giha û ka ji der û dora gund kom dikir. Lê niha em neçarin ka û gihayê ji derve bikirin da ku em zivistanî bikin êm û bidin pezê xwe. Em êdî nikarin pez xwedî bikin. Serokomar 7 meh berê soz da ku qedexeyan rake. Lê 7 meh derbas bûn, Zozan hêj qedexe ne."

## Stadyomên Qamişlo bi wêneyên Olmpiyadê têne xemlandin






Projeya dengvedana werzîşê ya ku ji hêla komeleya El-Emel Sûriya Olmpiyada werzîşê li Stadyoma Şehîdên 12'ê Adarê ya li bajarê Qamişlo, bi beşdarbûna nûnerên Rêvebiriya Xweser, her wiha di bin parstina hêzên Asayîşê, Asayîşa Hewarê û Sotoro di 1'ê Tîrmehê de hate li darxistin ] w, heftiyek, dewam bike. Her wiha ev cara yekemîne Stadyomên Fotbolê ya bajarê Qamişlo bi wêneyên Werzîşên Olmpiyadê têne xemlandin.

Bi piştgirtiya pisporên werzîşê yên herêmê û bi alîkariya kesên ku bingeha ciwanên werzîşê yên Nûhatî avakirin. Ev Projeya dengvedana werzîşê ku beriya salekê li Stadyoma Şehîdên 12'ê Adarê ya bajarê Qamişlo hatiye destpêkirin. Ji bo li darxistina olmpiyadê Piştî imza kirina peymanê di navbera Yekîtî û Komeleya El-Emel a Sûrî, Yekîtiya werzîşê ya Herêma Cizîrê Stadyoma Şehîdên 12'ê Adarê, Heysem Kiço û yaneyên werzîşê xiste xizmeta olmpiyadê de. Her wiha perwerdêr, dadwer û lîstikvanên werzîşê yên ku di yaneyan de dilîzin û çavdêrvanên şampoyn û dewreyên Herêma Cizîrê çi lîstikên tekane û çi yênê giştî jî beşdarbûn.

**OLMPİYAD WÊ HEFTİYEKÊ DEWAM BİKE**


Lîstikên ku di vê Olmpiyadê de bêne lîstin jî evin: Karatê, Fotbul, Basketbul, Şetrenc, Volebol û Pînpong, her wiha jin û mêr ji temenên cuda beşdar bûn. Hêjayî gotinê ku ev Olmpiyad ji 1'ê îrmehê destpêkir û heya 7'ê mehê dewam bike, her wiha bi xelatkirina lîstikvanên serketî Olmpiyad bi dawî bibe." ***Ronahî/ Qamişlo***





## Daristan bi 300 hezar dar zer bû





Li Herêma Xoçvanê darên çaman ji ber sedemeke nediyar zer bûn. Şêniyên Xoçvanê bang li rayedaran kirin û xwestin rojek berî rojekê daristan bê xelaskirin. Qada daristaniyî ya herêma Xoçvanê ya Erdexanê di xetereyê de ye. 300 hezar darên çamê yên li ser girê Çiyayê Kisirê yê gundê Panikê yê Xoçvanê, îsal ji ber nexweşîyeke nehat zanîn çî ye zer bûn. Gundiyan xwest demildest mudaxileyî vê yekê bê kirin. Welatiyê bi navê Qasim Yildiz, anî ziman ku 12 sal berê li herêmê 300 hezar dar hatine danîn û got: "Darên ku me çandin bi qasî 2-3 metreyan bilind bûn. Min li vê dibistanê mamostetî kir û em her sal diçin daristanê û pîknîkê dikin. Lê îsal em bi vê rewşê re rû bi rû man, dar ji nişka ve zer bûn. Me rewş ji Midûriyeta Daristanê re ragihand. Hin mirov dibên ji ber bêxurekiyê dar kokên hev dixwin û hin jê dibêjin ji ber nexweşîna kivarkan e û hin jê jî dibêjin ji ber baraneke zêde ye."

**BILA DEMILDEST MUDAXILE BÊ KIRIN**

Yildiz bang li rayedaran kir û got: "Em xemgîn in. Li gundê me 300 hezar darên me yên çamê hebûn û em pê serbilind bûn. Piştî dar mezin bûn û ev qad veguherî daristanê, heywanên kovî jî hatin vira. Her wiha me destûr nedida ku nêçirvan biçin nêçîra van heywanan. Lê niha jî ev daristana xweşik bi tunebûyînê re rû bi rû maye. Em dixwazin rayedar ji bo vê yekê tiştekî bikin."...*MA*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 407 6 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Ti xêr ji wan nayê



Mihemed SEYDÎ *R-5*

## Pirsgirêka Sûriyê bi şer çareser nabe



Hevserokê Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê Aldar Xelîl di Konferansa Yekemîn a Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Bakurê Sûriyê ku li Reqayê hat lidarxistin de axivî û diyar kir ku pirsgirêka Sûriyê bi rêyên eskerî û şer çareser nabe û da zanîn ku ew bi her awayî ji dan û standinan re amade ne.*R-4*

# DIVÊ DESTÛREK DEMOKRATÎK BE



### TI DIYALOG PÊK NEHATINE

Berdevkê Navenda Têkiliyên Dîplomasî ya TEV-DEM'ê Kemal Akif derbarê pêşketinên dawî de civîneke çapemeniyê li navenda xwe ya Qamişlo lidarxist. Akîf diyar kir ku bêyî hêzên bakurê Sûriyê destûreke demokratîk nikare bê ava kirin. Akîf destnîşan kir ku ew bi danûstandinên li ser bingeha çareseriyê ne û got, "heta niha di navbera me û rêjîmê de ti diyalog pêşneketine."

### DIVÊ GELÊ EFRÎNÊ VEGERE


Akîf bal kişand li ser dagirkeriya Tirk ya li Efrînê jî wiha got, "Dewleta Tirk a dagirker kiryarên xwe didomîne. Hemû qanûnên navdewletî binpê dike. Civaka navdewletî ji li hember van hemû kiryaran bê deng e. Zêdeyî 150 hezar welatiyên Efrînê di rewşeke zor û zehmet de dijîn. Divê civaka navdewletî erk û berpirsyariya xwe pêk bîne da ku gelê Efrînê vegere cih û warên xwe. *R-4*

## Pêşdeçûna QSD'ê berdewam dike



Pêngava Bagera Cizîrê di qonaxa xwe ya duyemîn de ya ku di 4'ê Hezîranê de ji nû ve dest pê kiribû, bi hemû hêza xwe didome. Şervanên QSD'ê gundên Medîna û Qebir Taha yên dikevin başurê rojhilatê navçeya Şedadê ji çeteyên DAÎŞ'ê rizgar kirin. Li gundên Til Zeheb û Seraciyê jî şerên giran rû didin. *R-2*

## Senatorê DYE'yî Tirkiye hişyar kir




Senatorê DYA'yî û endamê Komîsyona Xizmetên Çekdar Lîndsey Graham li Bexdayê daxuyanî da û derbarê zêdekirina êrîşên dagirkeriya Tirk ya li ser Rojava de hişyarî da û got, "Di rewşeke wiha de wê Tirkiye bikeve nava çiravekê." Her wiha Grahan li dij derket ku dagirkeriya Tirk a li Efrîn, Bab û derdora wê bê kûrkirin. *R-5*

## Di meşê de teqîn pêk hat



Ev demeke gelê Minbicê li hember polîtîka û êrîşên dagirker yên dewleta Tirk di nava liv û tevgerê de ye. Pêkhateyên Minbicê bi meş û çalakiyên nerazîbûnên xwe li dijî dagirkeriya dewleta Tirk nîşan didin. Duh di meşa ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk de ku pêk hat teqîn pêk hat û herî kêm kesekî jiyana xwe ji dest û 22 kes jî birîndar bûn. *R-2*

## Li Minbicê sîstemek demokratîk heye



Endama Dîwana Meclîsa Qanûndanînê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê Emel Dede ya ku ji pêkhateya Tirkmen e diyar kir ku piştî Minbic hat rizgar kir sîstemeke demokratîk lê hat pêşxistin û got, "Jin jî di vê sîstemê de bûne xwedî maf û îrade û di her qadê de cihê xwe girtin." *R-3*

## Endamtiya Tirkiyê ya YE'yê bû xeyal



Raportora Tirkiyê ya Parlementoya Ewrûpayê Katî Pîrî diyar kir ku helwesta Parlementoya Ewropayê neguheriye û got, "Mixabin dewleta Tirk tu guherîn pêk neanî. Divê heta 5 salan ew xeyalên xwe yên endamtiyê ji bîr bikin. Di rapora îsal a Tirkiyê de em ê bang bikin ku bila muzakereyên bi Tirkiyê re werin sekinandin." *R-5*

## Kurdan Norweç protesto kirin



Piştî Norweçê aktîvîsta Kurd Gulîzar Taşdemîr radestî Tirikiyê kir, Kurdan û dostên xwe li paytext Osloyê bi çalakiyekê şermezarkirin. Hate ragihandin ku Norweç ji ewlehiya jiyanî ya Taşdemîr berpirsyar e û ev biryara Norweçê ya dersînorkirina Taşdemîr nayê pejirandin û radestkirin hat şermezar kirin. *R-5*


## Hucreya Mandela ji bo şevekê tê firotin



Ji bo fînansekirina bernameya alîkariya girtiyên li Başûrê Afrîkayê, hucreya serokê dîrokî yê welat a Nelson Mandela ji bo şevekê derket ber firotinê. Tevgera bi navê CEO Sleepoût got, "Yên ku mîqtara herî zêde bidin, ew ê di vê hucreyê de ya ku Mandela tê de 17 salan mabû, şevekê bimîne." *R-2*

## Duyemîn konferansa Kongreya Star wê bê lidarxistin

Berdevka Fermî ya Kongreya Star Evîn Siwêd ragihand ku wan dest bi amadekariyên lidarxistina duyemîn konferansa Kongreyê kirine û niha civînên xwe li seranserî herêmê lidardixînin. Swêd diyar kir ku piştî civînan wê konferansên her sê herêman bên lidarxistin. *R-3*



## Leyla Guven nayê berdan



Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk KCD'ê Leyla Guven ku di zîndanê de girtiye, di hilbijartinên 24'ê Hezîranê yên li bakurê Kudistanê û Tirkiyê de weka parlementerê HDP'ê yê Colemergê hat hilbijartin. Lê tevî vê jî Guven nayê berdan. Ji bo Guven bê berdan parêzeran serlêdan kirin lê ev daxwaza wan hat redkirin. *R-5*

## Barzanî dagirkeriya dewleta Tirk rewa dike



Nerazîbûnên li dijî daxuyaniyên li dijî PKK'ê yên Neçîrvan Barzanî berdewam dikin. Parlamentera berê ya Iraqê Rengîn Ebdullah diyarkir ku daxuyaniyên Nêçîrvan Barzanî, dagirkeriya dewleta Tirk rewa dike û got; "PKK'ê li Şengalê li hemberî çeteyên DAIŞ'ê şer kir û sînorên Herêma Kurdistanê parastiye. Divê her kes piştgiriya PKK'ê bike." *R-5*

## 4 leşker û 5 çete hatin kuştin



Şervanên YPG û YPJ'ê li Efrînê li dijî leşker û çeteyên dewleta Tirk ya dagirker çalakiyên bi tesîr lidardixin. Di van çalakiyan de derbên giran li dagirkeran tê xistin. Navenda Ragihandinê ya YPG'ê ragihand ku di çarçoveya qonaxa duyemîn a Berxwedana Efrînê di çalakiyên vê dawiyê de 4 leşker û 5 çeteyên dewleta Tirk hatin kuştin. *R-2*

## Li bakur çalakiyên gerîlayan mezin dibin

*R-2*

## Li Derayê bombebaran giran e

*R-2*

# Di meşê de teqîn pêk hat

**_Ev demeke gelê Minbicê li hember polîtîka û êrîşên dagirker yên dewleta Tirk di nava liv û tevgerê de ye. Pêkhateyên Minbicê bi meş û çalakiyên nerazîbûnên xwe li dijî dagirkeriya dewleta Tirk nîşan didin. Duh di meşa ku li dijî dagirkeriya dewleta Tirk de ku pêk hat teqîn pêk hat û herî kêm kesekî jiyana xwe ji dest û 22 kes jî birîndar bûn._**



Li Minbicê dema ku êrîş û gefên dagirkeriya Tirkiyê bi meşekê dihat protestokirin, teqînek pêk hat. Di teqînê de kesek mir û bi dehan kes jî birîndar bûn.
Li Taxa El Haya ya Minbicê şêniyên bajêr dema ku dewleta Tirk protesto dikirin, teqînek pêk hat.
Li gorî qeydên nexweşxaneyê herî kêm kesek mir û 22 kes jî birîndar bûne. Hin çavkanî diyar dikin ku 3 kes mirine û 40 kes birîndar bûne lê ev agahî nehate piştrastkirin.
Hê kesî ev teqîn li xwe negirtiye lê ji ber ku di dema protestokirina dewleta Tirk de ev teqîn pêk hatiye, hin şik û guman derdikevin holê.

## 4 leşker û 5 çete hatin kuştin



Hêzên YPG/YPJ'ê li Efrînê derbên giran li eşker û çeteyên dewleta Tirk a dagirker didin. Di çalakiyên vê dawiyê de 4 leşker û 5 çeteyên Tirk hatin kuştin.
Navenda Ragihandinê ya YPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand ku di çarçoveya qonaxa duyemîn a Berxwedana Efrînê de, dawiya meha Hezîranê û destpêka meha Tîrmehê li dijî artêşa Tirk a dagirker û komên wê yên çete çalakî hatine kirin.
Li gorî daxuyaniyê, 30'ê Hezîranê li ser rêya navbera Efrîn û Mabetayê li pêş çeteyên Feylaq Şam kemîn hatiye danîn û di çalakiyê de leşkerekî Tirk hatiye kuştin, gelek çete jî birîndar bûne. Navendê diyar kir ku hêzên wan roja 1'ê Tîrmehê li baregeheke çeteyên Feylaq Şam dane û di vê çalakiyê de ku li herêma navbear gundên Meryemîn û Malikiyê yên Şerayê hate kirin, 4 çete hatin kuştin, 3 çete jî birîndar bûn.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin, 2'ê Tîrmehê li taxa Mehmûdiyê ya Efrînê li dijî leşkerên Tirk çalakiya sabotajê hate kirin û 3 leşker hatin kuştin, 2 leşker jî birîndar bûn.
Di dewama daxuyaniyê de hate gotin, 2'ê Tîrmehê li ser rêya Efrîn û Racoyê bi sûîqestê çeteyekî koma Firqet Hemze hatiye kuştin.
Navenda Ragihandinê ya YPG'ê diyar kir, 3'ê Tîrmehê jî piştî şopandineke demdirêj hêzên wan li bargeheke çeteyên Ehrar Şerqiye xistne, lê hejmara çeteyên hatine kuştin û birîndar bûne nehatiye zelalkirin.

**HEJMARA DAGIRKERÊN HATIN KUŞTIN BÛ 2502 KES**

Li gorî daxuyaniya navendê, ji destpêka êrîşên dagirkeriyê û vir ve 2502 leşker û çeteyên dewleta Tirk li Efrînê hatine kuştin.

## Pêşdeçûna QSD'ê berdewam dike



Şervanên QSD'ê gundên Medîna û Qebir Taha yên dikevin başûrê rojhilatê navçeya Şedadê ji çeteyên DAÎŞ'ê rizgar kirin. Li gundên Til Zeheb û Seraciyê jî şerên giran rû didin.
Pêngava Bagera Cizîrê di qonaxa xwe ya duyemîn de ya ku di 4'ê Hezîranê de ji nû ve dest pê kiribû, bi hemû hêza xwe didome.
Şervanên QSD'ê piştî şerên dijwar, gundên Medîna û Qebir Taha ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirin, her wiha bi dehan sivîl ji zilma çeteyan rizgar kirin.
Gundên Medîna û Qebir Taha dikeve başûrê rojhilatê navçeya Şedadê û li hemberî sînorê Sûriye û Iraqê ye.
Ji aliyê din ve şervanên QSD'ê piştî ku gundên Medîna û Taha rizgar kirin, berê xwe dan gundên bi navê Til Zehebû Seraciyê.
Li vê herêmê di navbera şervanên QSD'ê û çeteyên DAÎŞ'ê de şerekî giran heye. Şervanên QSD'ê bi pêş ve diçin.

## Li bakur çalakiyên gerîlayan



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku gerîlayan li Şemzînanê bi awayekî xurt li çeperên leşkeran dane. HPG'ê ragihand ku li Dersim û Amedê jî hêzên dagirker ên Tirkiyê operasyon dane destpêkirin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî têkildarî çalakiyên gerîlayan û operasyonên artêşa Tirk agahî da.
HPG'ê diyar kir ku li Şemzînanê hêzên wan girek du caran kirine hedef.
Daxuyaniya HPG'ê wisa ye:
"Di çarçoveya Pêngava Şoreşger a Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de hêzên me yên YJA-Starê di 4'ê Tîrmehê de saet di 09.00'an de li dijî girekî ku ewlehiya rêya qereqola Bezelê ya Şemzînana Colemêrgê pêk tîne, çalakiyek li dar xistine. Hêzên me ji 4 aliyan ve li vî girî dane û 3 kon îmha kirine. Di vê çalakiyê de hejmara leşkerên mirî û birîndar nehatine tespîtkirin. Di heman rojê de hêzên me saet di 14.00'an de cara duduyan li vî girî dane. Di vê lêdanê de jî hejmara leşkerên mirî û birîndar nehatine tespîtkirin.

**OPERASYONÊN ARTÊŞA TIRK A DAGIRKER**

Di 27'ê Hezîranê de artêşa Tirk a dagirker li Pasûr, Farqîn, Karaz, Licê û Hezroya Amedê operasyoneke berfireh daye destpêkirin.
Artêşa Tirk a dagirker di 28'ê Hezîranê de girtine ser gundê Lîcokê yê Licê û hin gundî destgîr kirine. Operasyon bêyî ku encamê werbigire di 30'ê Hezîranê de bi paş ve hatiye vekişandin.
Di 2'ê Tîrmehê de artêşa Tirk a dagirker li bejahiya Pulumura Dersimê operasyonek daye destpêkirin. Di operasyonê de helîkopteran gule li qadê reşandine. Operasyon bêyî ku encamê werbigire, ji qadê hatiye vekişandin."

## Li Derayê bombebarana giran



Rejîma Sûriyê û hêzên Rûs danê bomberdûmaneke giran li herêma Dera kirin.
Li gorî Saziya Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê, balafirên şer ên Sûriye û Rûsyayê bi sedan fuze û bombe li herêma derayê barandin.
Hate ragihandin, bomberdûman piştî biserneketina danûstandinên navbera Rûsya û komên dawî yên çekdar de pêk hat.
Midûrê Saziya Çavdêriyê Ramî Abdulrahman got, "Balafirên şer ên Sûriye û Rûsyayê hewl didin vê herêmê bikin mîna dojehê."
Operasyona li herêma Derayê 19'ê Hezîranê dest pê kir. Bomberdûmana ku sibeha Pêncşemê hate kirin, tê gotin ku ya herî giran e.
Cara yekê ye ku rejîma Sûriyê piştî sê salan nuqteyeke kontrola ewlekariyê ya li ser sînorê Urdunê bi dest xist.

## Hucreya Mandela ji bo şevekê tê firotin



Ji bo fînansekirina bernameya alîkariya girtiyên li Başûrê Afrîkayê, hucreya serokê dîrokî yê welat a Nelson Mandela ji bo şevekê derket ber firotinê.
Tevgera bi navê CEO Sleepoût hucreya Mandela yê ku li dijî rejîma Apartheîdê şer kiribû, ji bo şevekê derxist ber firotinê.
CEO Sleepoût got ku "Yên ku mîktara herî zêde bidin, ew ê di vê hucreyê de ya ku Mandela tê de 17 salan mabû, şevekê bimîne."
Hucre li ser girava Robben Islanê ya nêzî bajarê Capê ye. Yekemîn serokkomarê reşik ê Afrîkaya Başûr Mandela di vê hucreyê de mabû. Ev girtîgeh piştre ket lîsteya mîrateya cîhanê ya ÛNESCO'yê û salane 300 hezar kes tên serdana vê hucreyê.



# Koma Botan bi şoreşê re meşiya

**_Koma Botan ev 35 sale weke çemekî bo coş diherike û dibe deng û rengê civakê. Bi stranên xwe yên gelêrî û şoreşgerî cihekî taybet di hunera kurd ya hemdem de girtiye. Koma Botan a ku 1983'an de li Kobanê hat damezrandin, 35'emîn salvegera xwe pîroz kir._**



Bi boneya salvegera 35'an a damezrandina Koma Botan li navenda Çand û Hûnerê ya Baqî Xido şahiyek hat li dar xistin.
Koma Botan di sala 1983' an de bi tevlêbûna 6 endamên ji kantona Kobanê hate ava kirin. Ji wê demê ve û heta niha tevî şert û mercên zehmet gelek berhemên çandî afirand û bû bingeheke sereke ya parastina çanda herêmê pêk anî. Niha jî bi dehan endamên komê hene, di heman demê de gelek beşên wê yên taybet hatine vekirin. Di komê de gelek endam têne perwedekin û hin ji wan êdî bûne hunermendên naskirî di nava civakê de.
Endamên Koma Botan bi boneya salvegera xwe ya 35'an şahiyek lidar xistin. Serokê Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Kobanê Enwer Mislim, hevserokên TEV-DEM'ê Eyşe Efendî û Ehmed Şêxo jî di navd de bi sedan welatiyên katnonê beşdarî şahiyê bûn.
Şahî bi rêzgirtinê destpê kir. Piştre li ser navê TEV-DEM'ê Eyhan Kobanê axivî û 35'emîn salvegera Koma Botan pîroz kir û daxwaz ji her kesî kir ku xwedî li çandê derkevin.
Paşê sînevîzyonek li ser xebatên komê ku ji arşîvê hatiye amadekirin, hate pêşandan. Di şahiyê de endamên komê berhemên xwe yên çandî pêşkêş kirin.
Di dawiya şahiyê de Navenda Çand û Hunerê ya Kobanê endamên herî kevin ên Koma Botan xelat kir.



## Pêwestiya civakê bi zanistiyên hunerî heye

Melek DEMÎRTAŞ

Akadimî cihê zanist, hizir û ramiyariyê ye, da ku mirov kesayet avabike û pêşbixe û di encama kar û xebatê piratîkî de ew berhem dide diyar kirin. Akadimî ne mîna dibistan û zaningehê ye, wateya akadîmî ji van cudaye ji bo wê jî Pêwestî bi zanistiyên hunerî di civata Kurdî de heye, da ku civak li pêşkeve. Yek ji van Akadimiyan Hunerê ya Ş.Yekta Herekol li bajarê Terbespiyê ku ev sê salin hatiye vekirin û du dewreyên hunerî bi dawî kirine."



**AKADİMÎ ASOYEK FEREHE**

Girêdayî mijarê Rêvebirê Akadimiya Hunerê ya Ş.Yekta Azad Dêrism ser girîngî, armanc û guhertinên ku di dewreya sêyemîn de bêne kirin ev agahî dan û got: "Akadimî ji hemû dibistan û zaningehan cûdaye, ji bo wê pêwîste girîngiyek cuda bidinê. Ku em herdu dewreyên derbas bûyî binrxînin, li gorî girîngiya akadimiyê şagirt û civak nîzîkatiyek seranser jêre digire, her wiha civakek her bindest jiyan kiririye, ji zanist, felsefe, raman û huner kêm hatiye hiştin, dibe sedemên lewaz bûn astên mamoste, şagirtan û nerîna civakê ji zanistê re."

**SEDEMA TEMEN Û ASTA TENÊ 24 ŞAGİRT TEVLÎBÛN**

Azad da zanîn ku akadimî di sala 2015'an de li bajarê Qamişlo hate vekirin, lê ji ber dema dewreyên perwerdê saleke heye niha tenê du dewre hatin bi dawî kirin. Û wiha pêde çû: "Di dewreya yekemîn de 5 beş wekî mûzîk, şano, govend, sînema û wêne, her wiha di bênderê de jî perwerdeyên bîrdozî ji şagirtan re dihate dayîn. Dewreya duyemîn bi 40 şagirtî destpêkir, lê ji ber kêm asta û temenê biçûk nehatin pejrandin û wiha 24 şagirt di akadimiya Yekta de dewre dîtin, ku dewreya duyemîn di meha Çile de bi dawî bû."

**JÎ RAMANBÛNA TENG AST LAWAZ MA**

Azad bal kişand ser kêmasiyên ku di dewreya duyemînde derbasbû û wiha got: "Dewre wekî nîtelîk başbû, lê ji ber di milê temen piranî ciwanên nû hatî bûn, di astên hizir û girîngiya akadimiya Hunerê de lewaz bûn. Me di nav beşên hunerê de girîngî da milê bîrdozî da ku asta hizir pêşbikeve û dîroka çanda xwe binasin. Ev jî ji sedema ku carna civak an jî malbat di çarçoveyek malabtî û aborî teng difikire."

**MERCÊN TEVLÎBÛNÊ BÊNE GUHERTİN**

Azad da aznîn ku şagirtên ku derwereya duyemîn bi dawî kirine her yek li bajar û navendên xwe bi rengekî akadimî wê endamê perwerde bikin û projeyên nû avabikin û wiha dom kir: "ji bo ku em van pirsgirêk û lawaziyên di dewreya yekemîn û duyemîn de derbas bikin, dê emê di dewreya sêyemîn de guhertin çêbikin. JI bo wê jî rêzîkname, şert û mercên nû ji bo tevlî bûna şagiratn ji akadimiyê re tê amedekirin."

**RÊZÎKNAMEYA AKADİMİYÊ TÊ GUHERTİN**

Azad Dêrisim bal kişand ser hind guhertinên ku di dewreya sêyemîn de bêne kirin û wiha got: "Dewreya sêyemîn dê dawiya meha Tebaxê destpêbike, her wiha rêzîknameya akadimiyê jî li gorî pirgirêk û tecrûbeya herdu dewreyan hate guhertin. Demê perwerdê ji salekê bû 15 meh. Her wiha ji 5 beşan beşa wêjeyê lê zêdebû û bûne bû 6, her wiha temenê şagirtan ji 18 heya 40 salî tevlî akadimiyê bin, di heman demê de jî hazirtiya meteryalê beşan jî bêne perwerde kirin."




**HEYA 100 ŞAGİRTÎ DİPEJİRÎNİN**

Azad Dêrsim wiha bi dawî kir: "Ji bo hazirtiya meteryal jî, komîna şano yê beşê şano, komîna Govendê beşa govendê, yakîtiya rewşenbîran ya wêjeyî û wênesazî... hwd. Her wiha hewldanên me hene ku mamosteyên di hunerê de pispor ji bo akadimiyê bînin, lê jiber ambargoya sînorê rastî astengiyan tên. Ji bo hijmara qebul kirina şagirtan pêwîste her beş ne kêmî 10 şagirtî bin, 6 beşên hene dê ji 60 heya 100 şagirtî qebûl dikin."

## Hunermend û nandozî

Xelîl XEMGÎN



Parastin û vejandina nirxan, bingeha civakên pêşketî ne.
Îro civakên ku hebûn û giraniya xwe "ji her milî ve" xwe bi pêş xistine, bêguman, li ser hîma nirxên çandî, civakparêzî, aborî, exlaqî û wîjdanî xwe avakirine. Her wiha, civakên ku girîngî dane parastina nirxên xwe jî, herdemê pêşketina xwe misoger kirine. Berovajî vê rastiyê jî, civakên girîngî nedaye nirxên xwe, an jî mijara parastina nirxan, di rojeva xwe ya sereke de nîne û her demê mîna birîndarekî xwîn winda dike, nikare pêşketinên stratejîk biafirîne.
Tenê, di van 40 salên dawîn de, nirxên hatine afirandin û bedelên hatine dayîn em bînin bîra xwe. Ger li çargoşê cîhanê bigere, tu cefa, fedekarî û kedek bi vê mînakê nikare bibîne.
Ên dijberiya van nirxan, hevalbendên pergalê, derdorên menfeetperest, terîqetên (ideolojîk ) maldar û malbatên bi dewletê ve girêdayî û hwd. meriv mebestên wan dikare fêm bike!
Lê belê, ên hebûna xwe, nav û nasnameya takakesiya xwe, bi saya van nirxan û bii saya Tevgera Azadiyê de, bûn hunermend, hunerkar, navdar, maldar çevnebarî, nandozî, rantxurî û ezeziya wan, gelo meriv çawa fêm bike?
Mixabin, bi saya keda civaka me ya welatparêz, sazî û dezgeh û rêxistinên civakê, bi ked û fedakarî ew bûne xwedî nav û navdar.
Li ser ragihandinên civakî, mîna hûn xwendevanên hêja jî dişopînin, kampanyayên reşkirina tekoşîna gelê kurd û tevgera azadiyê didomînin. Mebesta dewletê û hevalbendên pergalê tê fêmkirin ku dixwazin kurdan tune, îmha û înkar bikin.
Lê mebesta ên keda sazî û dezgehên me di stuyê wan de, bi nirxên vê civakê, li ser sifre û nîmetê vê tekoşînê rentxurî qezenc kirine çi ye?
Her roj, li ser tevnên civakî êrîşên qirêj, li ser sazî û rêxistinên civakî parve dikin, kesayet û xebatkarên saziyan dikin hedef. Xwendevanên hêja, ger van mijarên wisa vekirî û zelal nebêjim, mijarê gelemperî bigirim dest, baş nayê fêmkirin.
1- Em wekî xebatkarên Koma Berxwedan 35 sal in, li derveyî welatê xwe, di bin hoyên giran û derfetên kêm de, li ser xêza tekoşîna azadiya gelê xwe, xizmeta çand û hunera gelê xwe dikin. Em çendî serkeftî bûn, an jî nebûn êdî ew biryar ya gelê me ye.
Di 35 salan de, bi bandora Koma Berxwedan û her wiha, di nava xebatên komê de, kêm an jî zêde, bi sedan ciwanên kurd hatin perwerdekirin. Gelek ji wan pakrewanên gelê kurd in, gelek jî, îroj xwe wekî hunermend binav dikin. Lê vê têbîniyê jî parve bikim ku hemû hunermendên li derveyî welat ne endamên Koma Berxwedan in. Her hunermendek an ciwanekî, di demên cur bi cur de, bi Koma Berxwedan re derketibin dikan an bernameyên TV'an nayê wê wateyê ku endamên komê ne.
2- Li ser ragihandinê, ên ku acizbûna xwe ji sekna vê komê, bi gotinên xirab û j bêrêz parve dikin û ên çepikan ji wan re lê didin hemû yên di qada xebata me ya çand û hunerê de, bi keda sazî û dezgehên me di qirika wan de, bûne kedxwerên nankor û bê wefa. Em wan gelekî baş nas dikin.
Ji bo manfeet û berjewendiyên xwe, ji bo dawetekê, klîbekê an bernameyekê an jî stranekê, tiştekî ku ev kes nefroşin tune ye.
Her wiha, em vê rastiyê jî baş dizanin ku cesareta van oportunîstan jî, ji ber kêmasî û ihmalkariya me tê. Yên ku îro ji Koma Berxwedan û TEV-ÇAND'ê re sixêfan dikin, duh di ekranên televîzyonên me de, di şev û şahiyên me de, bi xwêdana eniya vê civakê, mûçeyên xwe distendin.
Dizanim bê wefayî zor e, lê hûn jî bizanibin ku ev pirsgirêkên wisa, ne tenê pirsgirêka hunermendan e. Xemxweriya parastina nirxan, tê wateya xemxweriya bîrdozî…*Jêder-e-rojname*

## Li Şehbayê perwerdeya zimanê dayîkê

Li ser daxwaza welatiyên Efrînê yên li Şehbayê, komîna gundê Ehdas dewreyeke perwerdeyê ya xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî vekir.
Dewreya perwerdeyê 20'ê Hezîranê bi tevlîbûna 15 kesan ji zarok, ciwan, bi temen, jin û zilamam hate destpêkirin û li gorî 4 koman hatiye birêxistinkirin.
Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîl ji bo dayîna perwerdeyê mamosteyên zimanê Kurdî erkdar kir.
Perwerde li komîngeha gund hefteyê 3 rojan tê dîtin.
Derbarê mijarê de Hevseroka Komînê Emîne Xelo got: "Piştî ku dewleta Tirk Efrîn dagir kir, em neçar man ku ji Efrînê derkevin, lê me li vir di nava komînan de xwe birêxistin kirin. Me xwest ku dewreyên perwerdeyê werin vekirin da ku roja xwe vala derbas nekin û niha fêrî xwendin û nivisandina bi zimanê Kurdî dibin."
Emîne Xelo, hêvî kir ku Efrîn di demeke nêz de were rizgarkirin û gelê Efrînê li warê xwe vegerin…
*ANHA*

# Paqijkirina Reqayê bi dawî dibe

Bi destpêkirina Pêngava Rizgarkirina Reqayê re DAIŞ ji Reqayê hat derxistin û bajar hat rizgarkirin. Lê ji sedî 80 bajar xera bû. Her wiha çeteyan gelek mayîn li avahiyên bajêr bi cih kiribûn. Komîteya ji nû ve avakirinê ya Meclîsa Sivîl a Reqayê wê di rojên pêş de xebatên paqijkirina tevahiya bajêr bi dawî bike.



Piştî xebatên demdirêj ên ji nû ve avakirina Reqayê, Komîteya ji nû ve avakirinê ya Meclîsa Sivîl a Reqayê wê di rojên pêş de xebatên paqijkirina tevahiya bajêr bi dawî bike.
Di pêngava rizgarkirina Reqayê de çeteyên DAIŞ'ê mayîn li gelek cihan bi cih kirin. Çeteyên DAIŞ'ê malên welatiyan ji xwe re kirin baregeh û mayîn tê de bi cih kirin, lewra bajarê Reqayê bi temamî wêran bû.
Piştî bajarê Reqayê ji çeteyên DAIŞ'ê hate rizgarkirin, Meclîsa Sivîl a Reqayê û tîmên endezyaran xebatên bê bandorkirina mayînan dan destpêkirin. Paşê xebatên paqijkirina bajar hate destpêkirin.
Bajar bi rêjeya ji 80 % hatiye talankirin. 14 tax bi temamî hatine rûxandin û beşek kêm ji taxan zirar nedîtiye.
Komîte tevî derfetên xwe yên kêm dest bi xebatên paqijiyê kirin. Heta niha komîte karîbû pirraniya taxên bajêr paqij bike, komîteyê ji ber mayînan nikarîbû derbasî taxên din bibe, lewra komîte plan dike ku di rojên pêş de bi tîmên Endezyaran re derbasî wan taxan bibe û mayînan bê bandor bike.
Komîteya ji nû ve avakirinê derdora bajêr paqij kir û piştre derbasî navenda bajêr bû û li gorî vê nexşeyê dest bi xebatxebatan kir:
Taxa El-Mişlib: Dikeve rojhilata bajêr pir zirar ne dîtiye, rêjeya xiabûnê ji %6 derbas nake.
Taxa Rimêle: Dikeve bakurê bajêr. Riya tirênê ew dabeşî du beşan dike beşa başûr û beşa bakur. Heta niha komîteyê beşa başûr bi tamamî paqij kiriye, lê beşa bakur ji ber mayînên zêde hê tîmên endezyar paqijkirina wî bi dawî ne kirine.
Taxa El-Diriyê: Dikeve rojavayê bajêr. Ev tax bi temamî hatiye rûxandin. Komîte tax bi temamî ji tevahiya bermahiyan paqij kir.
Taxa El-Teyara: Dikeve aliyê rojava. Ev tax bi temamî hatiye rûxandin. Komîteyê ew paqijkirin û her wiha şêniyên taxê hewildidin mal û dikanên xwe li taxê ji nûve sererast bikin.
Taxa Pîşesaziyê (El-Sîna): Dikeve rojhilata bajêr. Çeteyan ji xwe re kiribûn navend û tê de kargehên mayînan vekiribûn û ji ber şerên ku di navbera QSD'ê û DAIŞê de li taxê rû da ne de, tax bi temamî hatiye wêrankirin. Komîte ev tax bi temamî paqij kir.
Taxa El-Romaniye: Dikeve rojavayê bajêr. Çeteyên DAIŞ'ê ev tax bi temamî teqandin. Komîteyê heta niha nîvê taxê paqij kiriye û xebatên paqijkirina tevahiya taxê berdewam dike.
Taxa El-Firat: Dikeve başûrê rojavayê bajêr û bakurê berava Firatê. Ev tax di rêza sêyem a taxên wêrankirî de cih digre. Çeteyên DAIŞ'ê ev tax bi temamî mayîn kiribûn lê tîmên endezyaran li taxê mayîn bê bandor kirin û komîteya ji nû ve avakirinê tevahiya taxê ji bermahiyan paqij kir.
Taxa El-Idîxar: Dikeve bakurê rojavayê bajêr. Tîmên bêbandorkirina mayînan tax ji mayînan paqij kir û komîteya ji nû ve avakirinê wê di rojên pêşde taxê paqij bike.
Komîte taxên El-Esbehiye, El-Hosiye, El-Seyadle û taxa Hîşem Bin Ebdulezîz, bi temamî ji bermahiyan paqij kiriye…*ANHA*

## Tevî zehmetiyan jî perwerdeya xwe dewam dikin



Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk ji bo xwendekarên Efrînê yên ku perwerdeya wan di nêvî de mabûn dest bi vekirina dibistanên navîn û amadehî kir.
Gelek dibistanên Efrînê di encama bomebebarana balafirên dewleta Tirk a dagirker de xirab bûn, lewra Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk û ji bo ewlehiya xwendekaran dibistan girtin.
Piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê çete û artêşa Tirk a dagirker ve gelek welatî neçar man ji malên xwe derkevin û li Kantona Şehbayê bi cih bûn. Welatiyan li Şehbayê xwe bi rêxistin kirin û sazî vekirin.
Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPC-D) ji bo xwendekarên ji perwerdeya werza duyem a sala perwerdê 2017-2018 pê par mabûn bi derfetên kêm, di 3'ê Hezîrana borî dibistanên seretayî ji 25 hezar şagirtan re vekir û niha jî dest bi vekirina dibistanên navîn û amadehî dike.
KPC-D, yekemîn dibistana navîn û amadehî li gundê Til Qerah ê navçeya Erizê ya Şehbayê vekir. 170 xwendekar li dibistanê perweredeya xwe dibînin.
Girêdayî mijarê endamê KPC-D ya Efrînê Zinar Elûş diyar kir ku armanca vekirina dibistanan vegera xwenderkeran ji perwerdê re ye û got, "Em ji tevahiya cîhanê re isbat dikin ku li ku derê dibe bila bibe û her çiqas em zor û zehmetiyan bikşînin jî, em perwerdeya xwe didomînin."
Elûş diyar kir ku ji ber dorpêça li ser Şehbayê di peydakirina pêdiviyên dibistanan û di meşandina xebatên perwerdê de gelek astengî û zehmetî kişandin. Elûş da zanîn ku wê xebatên vekirina dibistanan bidomînin û bang li rêxistinên mirovî û yên têkildar kir ku bi wan re alîkar bin û pêdiviyên dibistanan ji xwendekaran re peyda bikin…*ANHA*

## Ji ber pirsgirêka avê welatî zehmetiyê dibînin



Niştecihên hinek taxên Qamişlo ji kêmbûna avê gazincan dikin. Rêveberiya Komîteya Ava Vexwarinê ya Herêma Cizîrê jî diyar kir ku ji ber kesên bi qaçaxî avê dibin, nebûna ceyranê, polîtîkayên dewleta tirk a dagirker û xerckirina zêde ya avê ji aliyê welatiyan ve çareserkirina pirsgirêkê zehmet dibe.
Yek ji pirsgirêkên girîng ên bajarê Qamişlo jî kêmbûna avê ye. Bi taybet li hinek taxên wekî taxa Cûdî (Qanat Swês), Hilko û Cirnikê av kêm e yan jî hin caran nîn e. Kêmbûna avê jiyanê zehmet dike.
Ava Qamişlo ji 3 navendan tê, yek ji stasyona avê ya Sefan a Dêrikê, ya din ji stasyona Hilêliyê û stasyona Hewacê tê. Di heman demê de ji 12 bîrên li herêma rojhilatê Qamişlo û bîrên derdorê Çemê Çeqçeq jî av tê navenda Qamişlo. Li gel ku ji 3 stasyonan av tê Qamişloyê jî pirsgirêka avê derketiye.
Şêniyê taxa Cirnikê yê bi navê Dilgeş Xelîl pirsgirêkên avê yên taxa xwe anîn ziman. Xelîl diyar kir ku sedema nebûna avê li taxa wan kêmbûna ceyranê ye û wiha axivî: "Taxa me avê ji bîrê digire. Carinan 24 saetan saetek yan jî 2 saetan ceyran tê. Wê saetê jî carinan nîvê şevê tê. Gel bê av dimîne. Rast e ceyrana jenetoran heye, lê ceyrana jenetoran têra derxistina avê nake."
Jina bi navê Emîna Remezan a ku li taxa Cûdî rûdinê diyar kir ku av li Qanat Swês kêm e. Emîna destnîşan kir ku 3 rojan av tê, 4 rojan nayê û wiha got: "Dema av tê jî ceyran tune ye. Ji bo wê jî em nikarin avê bigirin."
Yek ji taxên ku pirsgirêka avê lê heye taxa Hilko ya girêdayî Kornîşe. Ji ber pirsgirêka xetên qaçax ên avê av qut bûbû û 15 rojan av nediçû ji gelê taxê re. Ji beriya çend rojan Mala Gel a Xerbî, Komîna Şehîd Lewend û rêveberiya ava vexwarinê li ser mijarê rawestan û ev 3 roj e av diçe taxê.
Berpirsyarê Komîteya Ava Vexwarinê ya Herêma Cizîrê Kawa Ebdo der heqê pirsgirêk û çareseriya ava vexwarinê ya bajarê Qamişloyê de diyar kir ku piştî ku şer li herêmê çêbû, wek hemû tiştî xetên avê, stasyon û sed jî xira bûn. Heta niha tişta ku dikeve ser milê me, me çareser kiriye. Kawa da zanîn ku yek ji pirsgirêkên mezin ku dibe sedema nebûna avê pirsgirêka ceyranê ye."
Kawa bal kişand ser bandora polîtîkayên dewleta tirk a dagirker û wiha pê de çû: "Ji sedan 70 pirsgirêkên me ya avê ji ber polîtîkayên dewleta tirk e. Dewleta tirk çemê Sefan ê ku herêma Cizîrê jê av digirt qut kiriye, dîsa ji Dêrik bi hezaran bîr kolane, ev jî bû sedema gelek kanî û çemên herêmê. Di heman demê de çemê Çeqçeq jî kiriye kanalîzasyon û em nikarin avê ji wir bigirin."
Kawa destnîşan kir ku li herêmê av bi rêk û pêk nayê xerckirin û got: "Em hêvî dikin, dema av tê bila gel pir bi hişyarî avê xerc bike. Ji bo taxên cîranên wan bê av nemînin. Divê gel jî alîkariya me bike."

## Heyva Sor a Kurd dewreyeke perwerdeyê destpê kir

Heyva Sor a Kurd li Şehbayê dewreyek perwerdeyê ya destwerdana lezgîn despê kir.
Piştî ku şêniyên Efrînê ji ber êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê neçar man dev ji warên xwe berdin û li Şehbayê bi cih bibin, Heyva Sor a Kurd bê navber alîkariya wan dike, li hember wan erka xwe pêk tîne. Heyva Sor li gorî derfetên xwe yên heyî gelek navendên tendurûstiyê û nexweşxane vekir.
Heyva Sor a Kurd ji bo peydakirina pêwîstiyan ji şêniyên re rastî gelek zehmetiyan hat.
Heyva Sor a Kurd dewreyeke perwerdê ya hemşîretiyê li navenda Heyva Sor a Kurd a li navçeya Ehres a girêdayî Şehbayê vekir. Dewreya perwerdeyê bi tevlîbûna 60 kesî destpê kir.
Di dewreyê de wê dersên li ser destwerdana lezgîn werin dayîn. Dewreya perwerdeyê wê mehekê dewam bike…*ANHA*

## Bi hezaran mamoste beşdarî perwerdê dibin

Bi hezaran mamosteyên Dêrazorê tev li dewreyên perwerdeyê dibin, ji bo ku li ser materyalên nû û pergala nû ya perwerdeyê pisporiya wan çêbe. Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ji 4 hezar û 668 mamosteyan re li Dêrazorê bi armanca pêşxistina asta mamosteyan dewreyên nû dan destpêkirin.
Hevserokê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Meclisa Dêrazorê ya Sivîl Kemal diyar kir ku ev qurs bi armanca pêşxistina asta mamosteyan dane destpêkirin. Mûsa da zanîn ku perwerdeyê ji 20`ê Hezîranê ve dest pê kiriye û hetanî 20'ê Tebaxê wê berdewam bike. Her wiha Mûsa diyar kir ku li rojhilatê Dêrazorê derdora 18 peymangeh hene…*ANHA*





# Li Minbicê sîstemek demokratîk heye

***Endama Dîwana Meclîsa Qanûndanînê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê Emel Dede ya ku ji pêkhateya Tirkmen e diyar kir ku piştî Minbic hat rizgar kir sîstemeke demokratîk lê hat pêşxistin û got, "Jin jî di vê sîstemê de bûne xwedî maf û îrade û di her qadê de cihê xwe girtin."***

Endama Dîwana Meclîsa Qanûndanînê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê Emel Dede got, "Em bi hev re bi îrade û keda xwe xebitîn û me Minbic ji nû ve zindî kir."
Emel Dede ku jineke Tirkmen a ji Minbicê ye, bal kişand ser şerê giran ê li Minbicê qewimî û diyar kir ku piştî rizgarkirinê di demeke kin de bajar ji mayinan hate paqijkirin, pir hatin çêkirin, dibistan hatin paqijkirin û sererastkirin û bi rêya komîteyên Rêveberiya Sivîl a Minbicê gelek xizmet hatin kirin.
Emel Dede bi bîr xist ku 4-5 meh piştî rizgarkirina bajêr, weke Meclîsa Sivîl wan xwe ji nû ve bi rêxistin kirin û got, "Me meclîsên xwe yen qanûndanîn û rêveberiyê ava kirin. Me Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê ragihand. Piştre jî komîteyên xwe ava kir. Gundên Minbicê gelekî zêde ne. Li navenda bajêr û gundan komun hatin avakirin. Di nava komunan de jî li gorî pêwîstiyê komîte hatin damezrandin."
Dede destnîşan kir ku pêwîstiya gelê Minbicê bi rastî jî bi xwerêveberiyê hebû û got, "Çawa ku ji bo rizgarkirina Minbicê me xwîna xwe rijand, ji bo avakirina jiyan û sîstema xwe ya rêveberiyê jî em bi daxwaz û fedakariyeke mezin



xebitîn. Rewşeke ewle afirî. Jin bûn xwedî maf û cihê xwe li nava rêveberiyê û her qada jiyanê girtin. Jin êdî li nava rêveberî, leşkerî, siyaset, asayîş, aborî û trafîkê cih digirin."
Endama Dîwana Meclîsa Qanûndanînê Emel Dede destnîşan kir ku wan bi hev re, bi ked û îradeya xwe Minbic ji nû ve zindî kirine û got: "Di nava du salan de weke Rêveberiya Sivîl a Minbicê me karên ku dewletên mezin nekarîn bikin, kir. Li Minbicê aramî, hezkirin, siyaset, xizmet, bi kurtasî jiyan bi rengekî demokratîk û azad ji nû ve afirî.."
Dede işaret bi sîstema hevserokatiyê kir û got, "Ji xwe bi vê sîstemê re em bûn xwedî rêveberiyeke demokratîk. Rêjeya tevlîbûna jinê ya li nava rêveberiyê 50 ji sedî ye. Rêveberiya me ji 132 kesî pêk tê. Hemû gelên li Minbicê li gorî rêjeya nifûsa xwe cihê xwe di nava rêveberiyê de digirin. 71 ji van ji gelê Ereb, 41 jê ji gelê Kurd, 10 jê ji gelê Tirkmen, 8 jê ji gelê Çerkez û 1 jî ji gelê Ermenî ye. Binerin, li Minbicê malbateke tenê ya Ermenî heye û ew malbat jî di nava rêveberiyê de nûnerê xwe heye. Li Minbicê ti carî rêveberiyeke bi vî rengî ya demokratîk ava nebûbû."
Emel Dede di dawiyê de got, "Em ê dest ji Minbicê û xurtkirina demokrasiya li Minbicê bernedin. Em bi îradeya xwe piştrast in. Me bi hêza xwe dest pê kir. Ya rast, ev hîn destpêk e. Em ji nû ve bi hêza xwe hesiyan. Em ê bi vê hêzê dewam bikin û bi ser bikevin. Bêguman ji bo dema bê, projeyên me hene. Me sîstema xwe çêkir û em bi pêş ve dibin."…*ANF*

## Duyemîn konferansa Kongreya Star wê bê lidarxistin

Berdevka Fermî ya Kongreya Star Evîn Siwêd ragihand ku wan dest bi amadekariyên lidarxistina duyemîn konferansa Kongreyê kirine û niha civînên xwe li seranserî herêmê lidardixînin.
Swêd diyar kir ku piştî van civînan wê konferansên her sê herêman bêne lidarxistin û wê nûnerên xwe ji bo beşdarbûna konferansa giştî diyar bikin.
Kongreya Star di 15'ê Çileya 2015'an de bi armanca birêxistinkirina jinan û têkoşîna wan a ji bo azadî û aktîfkirina rola wê di hemû aliyên jiyanê de hate damezrandin. Di 25-26'ê Sibata 2016'an de Yekîtiya Star 6'emîn konferansa xwe lidar xistin û di heman konferansê de navê xwe bi Kongreya Star guhert û weke Yekemîn konferansa Kongeya Star hate destgirtin. Di wê demê de konferans li bajaroka Rimêlan a herêma Cizîrê hate lidarxistin û têde 251 delegeyên kantonên Rojava beşdarbûn. Her wiha di konferasê de nûnerên ji yekîtiyên jinan ên bajarên Şam û Beyrûtê û hejmareke mêvanan ji pêkhateyên cûda û partiyên siyasî û rêxistinên sivîl beşdar bûn.
Niha Kongreya Star dest bi amadekariyên xwe yên lidarxistina duyemîn konferansa xwe dike û dê kar û xebatên Kongreyê yên van herdu salên borî binirxînin.
Girêdayî mijarê Berdevka Fermî ya Kongra Star a Rojava Evîn Siwêd diyar kir ku di yekemîn konferansa Kongreya Star de biryar hate girtin ku her du salan carekê konferansa Kongreyê were lidarxistin, lê îsal lidarxistina Kongreyê ji ber buyerên li Efrînê û dagirkeriya Tirkiyeyê li Efrînê hate derengxistin.
Evîn di berdewama axaftina xwe de wiha anî ziman: "Niha amadekariyên lidarxistina duyemîn konferansa Kongreyê tê kirin û beriya lidarxistina wê konferasên li ser astên hersê herêmên Cizîr, Firat û Efrînê dê bêne lidarxistin û dê nûnerên xwe ji bo beşdarbûna konferansa giştî hilbijêrin û dê raporekê pêşkêşî



konferansa giştî bikin."
Evîn Siwêd diyar kir ku gavên destpêkê yên amadekariya lidarxistina konferansan ew e ku li seranserî hersê herêman civîn dê bêne lidarxistin û dê rewşa Kongreya Star a du salan binirxînin û astengiyên rastî wê hatine gotûbêj bikin.
Evîn Siwêd destnîşan kir ku evan civîn dê heta dawiya meha Tîrmehê berdewam bikin û piştre dema lidarxistina konferansan dê bêne diyarkirin. Piştî ku konferansên hersê herêman bêne lidarxistin dema lidarxistina duyemîn konferansa giştî ya Kongreya Star dê were diyarkirin. Di konferansa giştî de raporên hersê herêman dê bêne xwendin û kar û xebatên Kongreyê dê bêne nirxandin û bêne erêkirin.
Der barê rewşa jinan li Efrînê Evîn Siwêd behsa rola sereke ya berxwedana Kongreya Star kir û destnîşan kir ku piştî welatiyên Efrînê neçarî koçberiyê hatin kirin, welatî li kantona Şehba bicih bûn û li vir jî Kongreya Star dîsa xwe birêxistin kir û dê li vir nûnerên xwe ji bo beşdarbûna konferansa giştî diyar bikin.
Berdevka Fermî ya Kongra Star a Rojava Evîn Siwêd di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku endamên Kongreya Star soz didin gelê xwe dê bi hemû hêz û derfetên xwe têkoşîn û berxwedana xwe berdewam bikin û azadiya xwe pêk bînin û xeta fikra rêberê netewa demokratîk Abdullah Ocalan berdewam bikin…
*ANHA*

## Divê jin li her qadên jiyanê têbikoşin

Xebatkara Firina Lîlîtê ya Qamişloyê Semîra Mihemed da zanîn ku ji ber ku ew dixebite û li ser lingên xwe disekine gelekî bextewar e û got: "Heta em jin li ser lingên xwe nesekinin û berxwe nedin em ê ji aliyê zihniyeta feodal û baviksalarî her bên çewisandin. Loma divê jin li her qadên jiyanê têbikoşin."
Piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê jinan di nav xebatên saziyan, siyasetê, civakê de cihê xwe girtin û bi vê yekê serkeftinên dîrokî pêk anîn. Gelek jinên ku di nava çar dîwaran de hatibûn hepiskirin niha bi keda xwe ya pîroz li ser lingên xwe disekinin. Ji van jinan yek jî Semîra Mihemed e. Semîrayê di firina jinê ya bi navê Lîlîtê ku ji aliyê Buroya Jinê ya Şaredariyê di 11'ê Kanûna 2016'an de hat vekirin de dixebite û dibêje ku bi saya xebatê ew bi hêztir bûye û nêrîna wê ya li jiyanê bi aweyekî erênî hatiye guhertin.
Semîr Mihemed a ku 32 salî ye û



diya du zarokan e dibêje: "Niha ez dixebitim û bi keda destên xwe zarokên xwe xwedî dikim ev yek ji bo min bextewariyek bê hempa ye. Di destpêka vekirina firinê de me gelek zehmetî kişand lê niha em bi awayekî serkeftî karê xwe didomînin."
Semîreyê anî ziman ku ew di nava xebatê de wekheviya gelan esas digirin û wiha dewam kir: "Em berê tenê 2 jin dixebitîn lê niha em 4 kes in. Di nav me de jinên Ereb jî hene. Lê em wek xwişkên hev li hev mêze dikin. Dema ku em dixebitin em cudatiyê nakin navbera xwe û em bi awayekî kolektîf dixebitin."
Semîrayê da zanîn ku Buroya Jinê ya Şaredariyê ji bo wan şanşek baş e û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Banga min ji bo hemû jinan ew e ku di nav çar dîwaran de nefetisin û beşdarî xebatê bibin. Ji bo jin neçewisin divê li her qadên jiyanê têbikoşin."…*JINNEWS*

## *Nanê sêlê ji destên dayîka Zuhre*

Zohre Kose ya 75 salî ku li Dîlokê dikana bi navê "Cihê Dayika Zohreyê" vekiriye û nanê sêlê, nanê malê û tiştên din difiroşe, diyar kir ku jin bi xebatê dikarin ji mêr xelas bibin û got: "Divê jin li malê rûnenên."
Li Taxa Duztepe ya navçeya navendî Şahînbey a Dîlokê, Zohre Kose ya 75 salî ku bi navê "Cihê Dayika Zohreyê" dikanek vekiriye, bêyî ku guh bide nexweşîyên xwe dixebite. Kose li dikanê xwe nanê sêlê, nanê malê û tiştên din difiroşe.
Kose, diyar kir ku bijîşkan jê re gotiye li mala xwe rûnê, lê belê wê guh nedaye van gotinan û ji bo muhtacî kesî nebe dixebite. Kose, diyar kir ku dema jin bixebite civak bi çavekî nebaş lê dinere û got: "Ma dema jin bi xwêdana eniya xwe bixebite û pereyan bi dest bixe şerm e?"

**MUHTACÎ KESÎ NEBÛM**

Kose, da zanîn ku 4 meh in wê dikan vekiriye, lê belê dîsa jî rewşa karê wê baş e û hem ew hem jî xebatkarên wê heqê xwe digirin.



Kose, anî ziman ku ew dixwaze jin bxiebitin û divê jin ji malê derkevin û got: "Li cem me tenê mêr dixebite û jin jî li malê ye. Dema jin bixebite gelê me vê yekê wekî tiştekî şerm dibîne. Ez xebitîm û min hemû zarokên xwe dan xwendin. Eger min guh bidana kesên digotin şerm e, min ê nikaribûna zarokên xwe bidana xwendin. Muhtacî kesî nebûm. Min nehişt zarokên min jî muhtacî kesî bibin."

**DIVÊ JIN LI MALÊ RÛNENÊN**

Kose, destnîşan kir ku divê jin bixebitin da negirêdayî mêr bin û got: "Pîvaneke ku tenê dê mêr bixebite tune ye. Divê jin li malê nemîne. Divê jin bixebitin. DIvê êdî civak dev ji vê fikrê berde. Tiştekî wekî ku mêr azad û jin girtî ye tune ye. Ma jin ne mirov e? Jin jî û mêr jî xwedî heman mafan e."
Hatîce Ozturk ku li cem Koseyê dixebite, anî ziman ku piştî hevjînê wê miriye ew li kar geriyaye û got: "Fikreke ku jin bixebite şerm e, tune ye. Jin jî dikare bxiebite. Jin ne muhtacî tu kesî ne. Jin bi tena serê xwe dikare li ser piya bisekine. Tenê bila xwestek hebe."…*MA*

# Bêyî kurdan destûrek demokratîk nabe

***Berdevkê Navenda Têkiliyên Dîplomasî ya TEV-DEM'ê Kemal Akif diyar kir ku bêyî hêzên bakurê Sûriyê destûreke demokratîk nikare bê ava kirin. Akîf destnîşan kir ku ew bi danûstandinên li ser bingeha çareseriyê ne û got, "heta niha di navbera me û rêjîmê de ti diyalog pêşneketine."***

Berdevkê Navenda Têkiliyên Dîplomasî ya TEV-DEM'ê Kemal Akif diyar kir ku tu danûstendinên cidî di navbera wan û rêjîama Sûriyê de nîne û wiha got: "Divê destûra Sûriyê ji aliyê nûnerên hemû gelê Sûriyê ve were amadekirin."

Berdevkê Navenda Têkiliyên Dîplomasî ya TEV-DEM'ê Kemal Akif derbarê geşedanên dawî civîna çapemeniyê li navenda xwe ya li bajarê Qamişlo lidar xist. Hejmarek rojnamavan beşdarî civîna çapemeniyê bûn.

Di civîna çapemeniyê de daxuyaniya TEV-DEM'ê bi zimanê Kurdî û Erebî ji aliyê Berdevkê Navenda Têkiliyên Dîplomasî ya TEV-DEM'ê Kemal Akif ve hate xwendin.

Daxuyanî wihaye:

"Dewleta Tirk a dagirker kiryar û binpêkirinên xwe didomîne. Hemû qanûnên navdewletî binpê dike. Rojane bûyerên revandin, kuştin û êşkenceyan di riya çeteyên xwe yên terorist re pêk tîne. Civaka navdewletî ji hemû bûyeran re bê deng e. Erka civaka navdewletî ye ku derbarê rewşa Efrîn û bûyerên diqewim in berpirsyariyên xwe pêk bînin, bi taybet jî derbarê guhertina demografî û êrîşa ku gelê me di kampan de dijîn. Lewma vegera gelê me yê Efrînê ji herêm û gundê xwe re pêwîstiyek e. Divê hemû hêzên navdewletî vegera wan a bi ewle misoger bikin. Di vê yekê de em ji Neteweyên yekbûyî hêvî dikin ku alîkariyên pêwîst bidin kampên kantona Şehbayê ku gelê me yên Efrînê li wan bi cih bûne. Niha zêdeyî 150 hezar welatiyên Efrînê di rewşeke zor û zehmet a jiyanê de dimîn in.



Divê dewleta Tirk ji Efrînê derkeve, pêwîste cîhan hemû bizane ku hebûna dewleta Tirk li Sûriyê li ser hemû herêmê û gelê me xweteriyê çêdike. Em di wê baweriyê de ne ku dê Efrîn rizgar bibe û dê gelê me bi rumet vegerin warê xwe.

**DIYALOGÊN BI RÊJÎMÊ RE**

Gelek aliyan ev mijar girtin dest. Em tekez dikin ku heta niha tu gavên cidî ji aliyê rêjîma Sûriyê ve nehatine avêtin. Em bi çareseriya ku li ser esasê danûstendinan pêk tê re ne. Gelê me li Bakurê Sûriyê gelek qurbaniyên mezin ji bo parastina xaka Sûriyê û yekbûna civak û xaknîgariya wê dan. Di nerîna me de dem hatiye ku aloziya Sûriyê were çareserkirin. Divê Sûriya demokratîk were avakirin, her wiha divê gavên cidî werin avêtin. Em ji danûstendinan re amade ne. Lê heta niha tu danûstendin nîn in.

**DESTÛRA SÛRIYÊ**

Em girîngiyê didin destûra ku pêwîste ji bo demokrasiyê ji aliyê hemû gelê Sûriyê ve were amadekirin. Divê destûr demokratîk be û hemû pêkhateyên Bakurê Sûriyê tê de hebin. Beşdarbûna Bakurê Sûriyê di amadekariya destûrê de mafekî rewaye. Wekî çawa gelê me erka xwe ya niştimanî di tekoşîna li dijî teroristan de pêk anî, divê rola me di amadekekirina destûrê de jî hebe. Bi dûrxistina hêzên Bakurê Sûriyê ne mumkine destûrek temam pêk were û ne mumkine pêdiviyên gelê Sûriyê pêk bîne.

## Pirsgirêka Sûriyê bi şer çareser nabe

Hevserokê Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê Aldar Xelîl diyar kir ku ti diyalog di navbera Rêveberiya Xweser û Rêjîma Sûriyê de çênebûne û got, "Ya herî girîng ew e ku em li dijî êrîşên muhtemel ji parastinê re amade bin, aliyên ku projeya me ya demokratîk qebûl nakin pir in, di serî de rêjîma Sûriyê ye."

Hevserokê Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê Aldar Xelîl di Konferansa Yekemîn a Hêzên Ewlekariya Hindirîn a Bakurê Sûriyê ku li bajarê Reqayê hate lidarxistin de axivî. Aldar Xelîl, diyar kir ku lidarxistina Konferansê gaveke girîng e.

Aldar Xelîl, diyar kir ku hêzên derve yên destwerdanê di rewşa Sûriyê de dikin û dagirkirina beşek ji axa wê ji aliyê dewleta Tirk ve, temenê aloziya heyî dirêj dike û axivî, "Dagirkirina bajarê Efrînê ji aliyê dewleta Tirk ve temenê aloziyê dirêj dike, ev yek divê neyê jibîrkirin. Ji xwe berxwdan di qonaxa xwe ya duyemîn de didome, lê di encam de Efrîn hatiye dagirkirin, pêwîste were rizgarkirin."

Hevserokê Desteya Rêveber ê TEV-DEM'ê Aldar Xelîl di berdewama axaftinên xwe de, bal kişand li ser gefên dagirkeriya Tirkiyê û rêjîma Sûriyê yên li ser herêmê da zanîn ku Tirkiye û rêjîm dixwazin bi van gefan tevliheviyê derxînin û ewlehiya herêmên Bakurê Sûriyê yên hatine rizgarkirina têk bibe û wiha dewam kir, "Em ji rêjîmê re dibêjin ku ew venagere mîna berê, em vî tiştî qebûl nakin, heger me qebûl kiriba me şoreş lidar nedixst û heger rêjîm ji aliyê gel ve hatibaya qebûlkirin, wê demê çima gel li dijî wê rabûna serhildanan û banga hilweşandina rêjîmê kir. Rêjîma desthildar, ya navendî ku xwe dispêre yekpartî, yeknetew, nayê qebûlkirin. Bi yek netew û yek partî sûriyeke demokratîk ava nabe. "

Aldar Xelîl anî ziman bi leşkerî û şer aloziya Sûriyê çareser nabe û got, "Heger me jî li hemberî aliyên ku êrîşî herêmên me kirin, me şer kir, ev ne xwesteka me, ev ji mafê me yê parastinê hatiye. Ji ber ku em şer naxwazin, lê dema êrîş li ser me were kirin em ê parastina xwe bikin. Alozî ne bi şer bi diyalogan çareser dibe."

Aldar Xelîl got, "Me helwesta xwe berê diyar kiribû, di mijara pêşeroja Sûriya bi rengekî demokratîk em ji bo diyalogan amade ne. Me li Rojava û Bakurê Sûriyê modêleke demokratîkbûyînê bi cih anî, ev jî bi qebûlkirin û razîbûna gel ji vê tecrûbeyê pêk hatiye. Rêjîm qaşo dibêje ew dixwaze danûstandinan bike, lê heta niha ti gavên ciddî ne avêtiye."



Aldar Xelîl, bal kişad li ser îdîayên ku dibêjin îtîfaq di navbera Rêveberiya Xweser û rêjîmê de heye û ev tişt anî ziman, "Hin alî tiştên ku çênebûne, îdîayan belav dikin, li ser torên civakî û malperan belav dikin. Rastiya van îdîayên tune ne, heya niha ti diyalog di navbera me û rêjîmê de çênebûne, ya herî girîng ew e ku em li dijî êrîşên muhtemel ji parastinê re amadebin û hewl bidin ewlehiya herêmên xwe xurt bikin. Hêzên ku projeya ma ya demokratîk qebûl nakin pir in, di serî de rêjîma Sûriyê ye."

Hevserokê Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê Aldar Xelîl wiha dawî li axaftina xwe anî, "Em ji diyalogan re amade ne, lê divê em ji bo parastina xaka xwe û herêmên xwe re amade bin. Heger îtîfaq çêbibe baş e, heger nebin, têkoşîna me berdewam e û em ê destkeftiyên xwe biparêzin."...***ANHA***

## Kurd bi artêşa Tirk re şer dikin, DAIŞ vedigere



Rojnameya navdar a Îngilîstanê The Independentê li ser zêdebûna bûyerên şîdetê yên li saheya Sûriyê nivîsî û diyar kir ku Kurd bi artêşa Tirk re şer dikin, DAIŞ vedigere. Nûçegîhanê Parastinê yê rojnameya Independentê Kim Sengupta nivîsek li ser zêdebûna liv û tevgera DAIŞ'ê nivîsî û diyar kir ku Kurd li gel artêşa Tirk şer dikin, DAIŞ dûbare vedigere.

Sengupta ku nûçeyên parastin û şer yên li Rojhilata Navîn dişopîne diyar kir ku li Sûriyê DAIŞ ji ber dînamîkên li herêmê guherîn dûbare vedigere û bûyerên şîdetê li sahê zêde bûne. Di heman nivîsê de bi taybet îşaret bi siyaseta hêzên koalîsyona navnetewî ya Amerîkayê tê kirin û têgotin ku siyaseta ku niha tê şopandin fersendê dide DAIŞ'ê ku zindî bibe. Sengupta di heman nivîsê de balê dikişîne ser êrîşên Tirkiye yên li ser Bakurê Sûriyê û dibêje, dema Kurd bi artêşa Tirk re şer dike, DAIŞ vedigere.

Sengupta çend nimûne ji bo zêdebûn û vegera çeteyên DAIŞ'ê ji bo Sûriyê dide û wiha dibêje, "Teqînên bombeyî yên li Reqayê, revandin û înfazkirina şervanên hinek komên çekdar, bidestxistina hinek herêmên nû û li vir jî çêkirina baregehan tenê çend nimûne ne." Independent diyar dike ku niha hejmara çeteyên DAIŞ'ê di navbera 8 heya 10 hezarî de ye û wiha dewam kir, "Wisa dihate zanîn ku DAIŞ bi temamî têk çûye lê, vedigere. Sedema wê ya sereke jî ewe ku dînamîkên li herêmê guherîn."

Di dewama nivîsê de jî wiha têgotin;

"Serokê Amerîkayê Donald Trump ferman da ku xebatên xwe yên li saheya Sûriyê kêm bikin. Hêzên Kurd ku Hevpeymanên Washingtonê yê li dijî DAIŞ'ê ne niha bi artêşa Tirk re şer dikin. DAIŞ wer difikire ku hêzên navnetewî yên piştgiriya Hêzên Sûriye Demokratîk dikin wê ji herêmên ku bi dest xistine vekişin û li dijî ew herêmên dibin dagirkeriya wan de ye jî nakevin tevgerê."

Balkêşe ku bi heman şêweyî liv û tevgera DAIŞ'ê û gelek komên din yên çekdar yên mîna DAIŞ'ê li Iraqê û li herêmên nakokî li ser hene jî zêde bûne. Li aliyekî dewleta Tirk li dijî Başûrê Kurdistanê êrîşên dagirkeriyê daye destpê kirin, li aliyê din jî ji Kerkûk heya Xaneqînê êrîşên çeteyên DAIŞ'ê hene û her roja paştir jî zêdetir dibin.

Gelek şîrovekar jî dibêjin, Tirkiye bi van êrîşên xwe yên li dijî Kurdan nefes bi DAIŞ'ê dide sitandin û pêşî li bihêzbûna çeteyan vedike.

## Di hilbijartinên Tirkiyê de hîle hatin kirin

Di konferansa 'HDP û hilbijartinên li Tirkiyê' de ku li Parlamenta Ewropayê (PE) pêk hat, işaret bi hîleyên AKP-MHP'ê hate kirin. Li Parlamenta Ewropayê li ser mijara "HDP û hilbijartinên li Tirkiyê" konferanseke çapemeniyê hate lidarxistin. Seroka Koma Dostaniya Kurdan a PE Marîe Chrîstîne Vergîat, bi bîr xist ku ew gelek caran çûye Tirkiye û Kurdistanê, hewl daye rewşê ji nêz ve bişopîne û dîtiye ku rejîmeke zordar û antî-demokratîk gav bi gav li Tirkiyê bi cih dibe.

Vergîat destnîşan kir ku yekane tişta erênî berxwedana HDP'ê û serketina wê ya di hilbijartinê de ye.

Ji Îngilîstanê endama Koma Sosyalîst a PE Jûlîe Ward jî bi bîr xist, ku heyeta ew di nav de bû li bajarê Agiriyê lêkolîn kirine û piştî gelek caran ji bendên kontrolê yên leşkerî derbas bûn, li cihên dengdanê jî li leşker û komên çekdar rast hatine.

Ward diyar kir ku wê li navendeke dengdanê jimartiye û got, "Li wê derê 20 kesên çekdar hebûn. Kesên ku deng didan HDP'ê dişandin cihên cuda. Li cihekî dengdanê pêşî li me girtin û ji me re gotin ku 'hûn dikarin bikevin hundir'. Hêzên çekdar nehiştin em biçin nava gund jî. Li gelek welatan tevlî heyetên hilbijartinê bûm, lê di vê astê de min zext û çavtirsandin nedîtiye."



# Senatorê DYE'yî Tirkiye hişyar kir

Senatorê DYA'yî û endamê Komîsyona Xizmetên Çekdar Lîndsey Graham li Bexdayê daxuyanî da û derbarê zêdekirina êrîşên dagirkeriya Tirk ya li ser Rojava de hişyarî da û got, "Di rewşeke wiha de wê Tirkiye bikeve nava çiravekê." Her wiha Grahan li dij derket ku dagirkeriya Tirk a li Efrîn, Bab û derdora wê bê kûrkirin.



Senatorê DYA'yî li ser hewldanên Tirkiyê yên ji bo girankirina êrîşên dagirkeriyê yên li Rojava hişyarî da û got, "Di rewşeke wiha de wê Tirkiye bikeve nava çiravekê." Senatorê DYA'yî û endamê Komîsyona Xizmetên Çekdar Lîndsey Graham, piştî hevdîtina bi Serokkomarê Tirk Tayyîp Erdogan, li Bexdayê daxuyanî da.

Graham li ser niyeta Tirkiyê ya ji bo zêdekirina êrîşên xwe yên dagirkeriyê hişyarî da.

Grahan li dij derket ku dagirkeriya Tirk a li Efrîn, Bab û derdora wê bê kûrkirin û got, "Di rewşeke wiha de hûnê bikevin nava çiravekê."

Graham da xuyakirin ku divê Tirkiye piştgiriyê bide hebûna leşkerên Emerîkî yên li Sûriyê û destnîşan kir ku hebûna van leşkeran tiştekî baş e.

Graham diyar kir ku wî gotinên xwe yên li ser hebûna leşkerên DYE'yî ji Serokkomarê Tirk re jî gotiye. Graham ji bo YPG'ê ya ku beriya niha ji xwe ragihandibû ku ji Minbicê derketiye got, mayina wan li rojhilatê Firatê têrê dike.

## Barzanî dagirkeriya dewleta Tirk rewa dike

Parlamentera berê ya Iraqê Rengîn Ebdullah diyarkir ku daxuyaniyên Nêçîrvan Barzanî, dagirkeriya dewleta Tirk rewa dike û got; "PKK'ê li Şengalê li hemberî çeteyên DAIŞ'ê şer kir û sînorên Herêma Kurdistanê parastiye. Ji bo vê divê serokê Hikûmetê li ser gotinên xwe daxuyaniyek bide."

Dagirkeriya dewleta Tirk a li ser xaka Başûrê Kurdistan dewam dike. Iraq û Hikûmeta Herêma Kurdistanê bêdengiya xwe di parêzin. Ne tenê bêdengî êdî serokwezîrê Herêma Kurdistan êrîşên dewleta Tirk rewa dibîne.




Li ser vê yekê parlamentera berê ya Iraqê Rengîn Ebdullah beşdarî tevevziyona Aryen bû û balkişand li ser axaftinên Nêçîrvan Barzanî. Rengîn bû mêvanê bernameya televziyona Aryen TV diyar kir ku serokê Hikûmeta Herêmê dibêje ku 'PKK'ê beşek mezin yê Herêma Kurdistanê dagir kiriye', ev gotin êrîşa dewleta Tirk a li ser Qendîl rewa dike û wiha axivî; "Ev gotin metirsiyek mezin çêdikin. Divê li ser van gotinan, serokê Hikûmetê daxuyaniyek ya wî hebe û bi de famkirin. Ji ber ku PKK'ê li Şengal li hember çeteyên DAIŞ'ê û parastina sînorên Herêma Kurdistanê kiriye. Evane hemû dibin sedem ku em piştgiriya PKK'ê bikin, ne ku bi dagirker nav bikin."

Herwiha parlamenera berê ya Iraqê Rengîn Ebdullah diyarkir ku divê Parlamentoya Herêma Kurdistanê divê helwestek a li ser vê yekê hebe û lêpirsînê li serokê hikûmetê bike û axaftina xwe bi van gotinan dawî kir;

"Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) dema ku çeteyên DAIŞ'ê êrîşê Şengal, Mexmûr û Kerkûkê kirin berê xwe dan çeperên şer û li hember çeteyên DAIŞ'ê şer kirin. Gerîlayan karîn bi hezaran Êzidî ji komkujiyê bi parêzin. Piştî vê niha dewleta Tirk a dagirker êrîşê Başûrê Kurdistanê dike. Gerîlayên azadiyê li hemberî vê yekê jî şer dikin û Başûrê Kurdistanê di parêzin."...***ROJNEWS***

## Endamtiya Tirkiyê ya YE'yê bû xeyal



Raportora Tirkiyê ya Parlementoya Ewrûpayê da zanîn ku divê di 5 salên pêşiya me de Enqere dev ji xeyalên muzakereyên endamtiyê yên Yekîtiya Ewrûpayê berde.

Raportora Tirkiyê ya Parlementoya Ewrûpayê Katî Pîrî ji beşa Tirkî ya DW'yê re diyar kir ku modela endamtiya Yekîtiya Ewrûpayê ji bo Tirkiyê êdî ne opsiyonek e û diyar kir ji bo ku muzakereyên endamtiyê yên bi Enqereyê werin sekinandin, ew ê bang bikin.

**HILBIJARTIN NE BI EDALET BÛ**

Pîrî diyar kir ku kampanyaya hilbijartinê ne bi edalet bû û got, "Rêveberiya nû ya seroktiyê tê wateya ku ew ê gelek hêz were bidestxistin. Erdogan demokratê herî baş ê cîhanê be jî divê newekheviya hêzan ji bo her siyasetmedarî hebe. Lê di pergala nû de, ev tişt tune."

Pîrî got, "Parlementoya Ewrûpayê diyar kiribû ku heke guherîna destûrabingehîn ya ku hatibû kirin bi wî awayî têkeve meriyetê, ew ê banga sekinandina muzakereyan bikin. Em hatine wê astê. Helwesta Parlementoya Ewrûpayê nehatiye guhertin. Mixabin dewleta Tirk tu guherîn pêk neanî. Divê heta 5 salan ew xeyalên xwe yên endamtiyê ji bîr bikin. Di rapora îsal a Tirkiyeyê de em ê bang bikin ku bila muzakereyên bi Tirkiyê re werin sekinandin."

Pîrî axaftina xwe wiha dewam kir, "Ji bo endamtiya Yekîtiya Ewrûpayê divê demokrasiyeke lîberal hebe. Lê mirov li Destûra Bingehîn a Tirkiyê dinihêre, tê dîtin ku welat bi biryarnameyan bi rê ve dibin. Nabe ku di destê kesekî tenê de, ev qas hêz hebe."

Pîrî diyar kir ku modela endamtiyê ji bo Tirkiyê êdî ne opsiyonek e û divê gelên Tirkiyê neyên îzolekirin. Pîrî bal kişand ser vî tiştî ku, Tirkiye 2 sal in guh nade gotinên wan û ew ne bawer in ku bi carekê re her tişt biguhere.

## Leyla Guven nayê berdan

Ji bo Hevseroka KCD'ê Leyla Guven a ku bû parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê bê berdan parêzeran serî li dadgehek bilindtir dabûn. Serlêdana parêzeran hat redkirin. Parêzerên Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) Leyla Guven a ku li Colemêrgê bû parlamentera HDP'ê bê berdan serî li 9'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê dabûn û dadgehê biryara berdanê dabû. Li ser vê yekê Serdozgeriya Amedê îtîrazî berdana Guven da û 10'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê berdanê red kir.

BERDANA GUVEN RED KIRIN

Parêzera Guven, Reyhan Yalçindag Baydemîr li ser vê biryara dewama girtina Guven, di 3 tîrmehê de serî li dadgehek bilind da û îtîrazî 1'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê kir.

Dadgehê îtîraz nirxand û bi pirraniya dengan îdia kir ku dewama girtina Guven ne li dijî rêbaz û qanûnan e û îtîraza ji bo berdana wê hat kirin red kir.

Li ser vê biryara redkirina berdana Guven wê parêzer serî li Dadgeha Destûra Bingehîn (AYM) bidin.




## Kurdan Norweç protesto kirin

Piştî Norweçê aktîvîsta Kurd Gulîzar Taşdemîr radestî Tirikiyê kir, li paytext Osloyê bi çalakiyekê hate şermezarkirin.

Kurd û dostên xwe li ber Wezareta Karê Derve ya Norweçê, radestkirina Taşdemîr a ji bo Tirkiyê şermezarkirin. Tevgera jinan a Norweçê Kvînnenfronten û rêxistina antî faşîst Motmakten jî tevlî çalakiyên bûn.

Di axaftina li ser navê Rêxistina Ciwanên Kurd ên Norweçê Ûngkurd hatî kirin de, hate ragihandin ku Norweç ji ewlehiya jiyanî ya Taşdemîr berpirsyar e û ev biryara Norweçê ya dersînorkirina Taşdemîr nayê pejirandin.



Di axaftina li ser navê Meclîsa Gelê Kurd a Osloyê hatî kirin de jî, ev radestkirin hate şermezarkirin û hat gotin ku wê şopdarê bûyerê bin.

## Ti xêr ji wan nayê



Mihemed SEYDÎ

Gotineke pêşiyên me heye wiha ye "di rojên teng de ya derdikeve holê mêraniye" berovajî vê jî li ber çavaye.

Dagirkeriya dewleta Tirk û dijminatiya wan ji bo gelê kurd di dîrokê de li ber çava ye û heta eşkere jî tê ziman. Ger em bala xwe bidin gotinên ku dibêjin ger li cihekî konekî kurdan jî hebe em ê rê nedin û heta ji destê me were em ê tune bikin ev rastiya dijminatiyê dirdixe holê .

Ha vaye dijminatiya dewleta Tirk di Dîrokê de. Em werin ser van salên dawî û ne zêde dûr. Dewleta Tirk di îdolojiya xwe de hebûna xwe bi tunekirina kurdan de girêdaye û heta ji bo tunekirinê jî faşîzim û nijadperestiyeke wiha pêşxistiye ku êdî ji bo wan bûye nexweşî.

Vê yekê jî çavên wan kur kirine û bi hemû rengî êrîşên xwe li ser kurdan didomînin. Heta ji gorên kurdan jî acizin û êrîşên li ser goristanan bi balefiran û bi kepçeyan wekî gornebaşan goran xiradikin..

Gotinên Tayîb Erdogan ên jin be jî zarok be jî tişta pêwist em ê bikin fermana kuştina kurdaye..

Em çiqas hovîtiya dijmin û faşîma niha ya AKP-MHP bînin ziman jî ew dijmine û dagirker û navê wê pêre ye.

Lê li dijî vê dagirkeriyê û dijminê bav û kalan(dewleta Tirk) çi tê kirin û hewlestekî çawa ji aliyên ku xwe bi nasnameya kurdîtiyê tînin ziman dirdikeve..

Me gelek caran daxuyaniyên rayedarên başûrê kurdistanê ji bo dagirkeriya dewleta Tirk dîtine. Û yek ji ya din xirabtir û sosrettire û xwaziya bê deng bimana baştir bû. Lê rastiya wan ev, em ê li bendê bin daxuyaniyeke çawa bidin gelo? Ti xêr ji wan nayê.

Dagirkeriya li ser başûrê kurdistanê û bombebaran li gund û baxçeyên welatiyan didome. Bi dehan baregehên leşkerî hatine avakirin û hîne jî tên avakirin..

Gelê başûrê kurdistanê û tevgera azadiyê herî dawî careke din banga zelalkirina hewlesta xwe li dijî dagirkeriya dewleta Tirk li rayedarên başûr kurdistanê di serî de PDK kir. Vê carê jî firsendeke ku belkî ji xeta îxanetê û li cem dagirkeran cih girtinê vegerin. Lê ne xêr her daxuyaniyek ji ya din sosrettir û xirabtire.

Êdî ti xêr ji wan nayê û wê ti carî jî ji vê xetê (xeta xiyaneyê)venegerin, ev êdî ketiye xwîna wan.

Pênaseyek wiha li ser daxuyaniya Nîçirvan Berzanî ya ku tevgera azadiya kurd li ser axa kurdistanê dagirkerî dibîne û dewleta Tirk jî rewa dibîne ew e ku bi vê yekê tê pênase kirin "Nîçirvanê gelê xwe ye" tam di cihê xwe de ye ev gotin.

Vaye ji bo dewleta Tirk nêçîrvanekî baş niha derketiye meydanê, ew jî Nîçirvanê Berzanî ye û baş bi rola xwe radibe.

Niha û şûnde wê kes ne li hêviyê be ku rayedarên başûrê kudistanê ji bo rizgarkirina gelê başûr û axa başûr ji dagirkeriya dewleta Tirk tiştekî bikin.

Ji ber vê yekê helwesta bi bandor û xwedî rol ku derkeve di sêrî de ya gelê başûr kurdistanê û ya hemû kurdistaniyan e.

li hemberî hikumeta PDK'ê ku di bin nasnameya kurdîtiyê de xwe vedşêre gelê başûr êdî sebra wê nemaye û wê hesab bixwaze. Ji ber ku yên ne li dijî dagirkeriyê bin bi xwe dagirkerin û divê dagirker li ser axa kurdistanê bêne qewitandin.